

# POP KURD




PoPirs | ÖZLEM TAŞ



İnan Eroğlu | Swing û Amed



Xezala Redkani | Kurd û İntihar



## KEMAL KAHRAMAN

“ Ji bo qada  
nivîsê  
Gilgamiş  
çi be, ji  
bo çanda  
devkî jî  
Şahmeran  
ew e...”








Silav xwîner û bendewarên me yên delal, Sibat e, tesîra  
sermayê hêdî hêdî dişkê. Me gelekî bêriya we kir û va ye em bi  
hejmara xwe ya çarem li ber we ne. Va ye kulîlka yekem a biharê  
**POPKURD** jî hat û li ber we ye.

De kerem kin.

POPKURD  
02/2019 • Jimar 4

**Berpirs û Edîtor**  
Mistefa Dogan

**Edîtorê Dîtbariyê**  
Ridwan Xelîl

	+90534 325 3629		popkurdkovar		
	PopKurdKovar		PopKurdKovar		popkurdkovar@gmail.com
	popkurdkovar.wordpress.com		channel/UC7OVendzXoCAzJC2wf_KVYw		

# NAVEROK



## RIHLETGUZÎN

Mihemed BÎLEN  
Rûpel 04



## KEÇIKÊN GUNDÊ ME YOUTUBER IN

POPKURD  
Rûpel 09



## MEHLA KURDAN

POPKURD  
Rûpel 13



## KURD Û ÎNTIHAR

Xezala Redkanî  
Rûpel 14



## ME JI ŞA'IR Û NIVÎSKARAN PIRSÎ

POPKURD  
Rûpel 18



## KURDÊN JAPONYAYÊ

Îbrahîm Gênc  
Rûpel 19



## POPNUÇE

POPKURD  
Rûpel 24



## HEVPEYVÎN: KEMAL KAHRAMAN

Rûken Hekaryan  
Rûpel 25



## SWÎNG Û AMED: LI PEY 'DANSA HERÎ BIKÊF A DINYAYÊ'

Înan Eroğlu  
Rûpel 28



## POPIRS: ÖZLEM TAŞ

POPKURD  
Rûpel 33




## ME JI 10 KESAN PIRSÎ

POPKURD  
Rûpel 35



## AVESTAYÊ CIHÊ XWE YÊ NÛ VEKIR

Mewlûd Oguz  
Rûpel 39



## TRÊNA KU DIÇE WELÊT

Şivano Keleş



Serwero  
Rûpel 42



GUH LI DENGÊN  
MARAKÊŞ Û  
CASABLANCAYÊ

# FAS



**RIHLETGUZÎN**

Mihemed BÎLEN

mehmetihsanbilen@gmail.com

## Casablanca

Hin bajar hene divê mirov bi dora wan nekeve. Ev 'hin' bajarên bi qasî xewneke lihevhatî yê we ji xwe re di serê xwe de lêkirine, roj bê dikare bi çavlêketinekê birûxin û serobino bibin. Ew divê wekî îmajine fotografik ango wekî hin dîmenên sînematografik bi mirovî re bijîn. Divê mirov dest nede xêliya efsûnî ya li ber rûyê wan.

Filma Michael Curtiz ya efsanewî Casablanca, wê hisê dide mirov ku ev bajarê egzotik ê bûyer lê diqewime bi qasî xeyala xewnekê xweşik, bi qasî tabloyeke realist jî bi dev û lêv û bi beden û giyan be. Ev filma klasîk a tîr action û mişt romantîzm dê bike ku hûn dil berdin vî bajarê qedîm ê li mexrîba bakurê Efrîqayê. Hûn dê ne tenê dil berdin bajêr, keç xwe wekî evîndarê Humphrey Bogard û kur jî xwe wekî dildarê Ingrid Bergman zevt bikin.

Ellias Canetti, di berhema xwe ya bi navê 'Dengên li Marakêşê' de behsa bajarê Marakêşê dike. Ew jî bi kêmanî bi qasî Casablancaya Michael Curtiz sûretê bajarekî bi heybet çêdike, lê kengî mirov li van her du bajarên Fasê bigere, kîjan berhem fiction, kîjan nêzî rastiyê ye dê bi rehetî bibîne.

Balafira me ya li asoyê Casablancayê dema ji bo daketînê hazirî dikir, bi miraq û kelecana min jî ji jor ve li bajêr temaşe dikir. Stenbol û çend bajarên din ên cihanê ne di nav de, wekî hemû metropol û paytextan ev der jî li ser deşteke ava bûye. Digel ku bajarekî nêzî çolistanê ye jî, têra xwe hêşîn e. Wexta em digihêjin otêla em ê lê bimînin resepsiyonîstê otêlê bi awir, şewqe û qapûtê Humphrey Bogardî me pêşwazî dike. Her çiqas ev jêsteke tûrîstîk be jî, ji bo yê dabîn dî şopên filma Casablancayê Surprîzeke xweş bû. Ev welatê rojavayê bakurê Efrîqayê zêdetirî 40 salan di bin desthilatdariya Frensiyan de maye. Wekî dîmenên li kuçeyên Diyarbekirê, li Casablancayê jî zimanê serdestan li ber yê netewî tê bikaranîn. Du zimanên fermî yên welêt hene, Erebi û Frensî.

Casablanca rawestgeha me ya ewil bû û me sê rojên xwe yên ewil li wira bihurandibûn. Di van sê rojên li sikak û meydanan derbasbûyî de, hê jî em pêrgî tiştê lê digeryan nehatibûn. Li navenda bajarê kevn ê Casablancayê, wekî ku em li Parisê bin, li serê her quncikê cafeyeye parisien derdiket pêşberî me. Vexwarina qehweya tal û çaya naneyî ya mişt şekir a li ber dengê Edit Piaf û Jacques Brelî, yek ji taybetiyên ji rêzê yên cafeyên Casablancayê bûn. Avahiyên nav-



enda bajêr wekî yên bajarekî Ewropayê kevnar lê mixabin bi qasî wan ne pak û paqij bûn.

Ji ber ku em rêberek bi kar naynin, di nav bazara bajarê kevn de em riya xwe şaş dikin. Em wê mottoya meşhûr tînin bîra xwe, 'Serguzeşteke heta rê şaş neke rê nas nake' û em xwe li kuçeyên nenas diqelibînin. Li serê her kuçeyê, bi buhayên gelek erzan rûnê argan tê firotin, em jî xwe jê kêr nahêlin û çend lîtreyan dikirin. Ev rûnê di xwarin û endustriya kozmetîkê de tê bikaranîn, li gorî saloxdanan yek ji dermanê por û çermê herî baş e. Jinên Fasî jî bedewî û biriçîna çermê xwe ji vî rûnî werdigirin xwedêgiravî.

Li gelek cihan em beroşên ji heriyê hatine çêkirin li ser tifikan dibînin. Wexta em dixwazin qepaxa beroşê vekin bê ka çi di nav de ye, navdartirîn xwarina gelêrî ya Fasiyan derdikeve pêşberî me. Tajîn e navê beroşê, ev xwarina navdar jî navê xwe ji beroşa xwe digire. Di tajînê de hûn çi bixwazin heye; goşt, nokê kelandî, sîr, bilxur, mişmiş û incasên hişkîrî, zencefil, zerdeçel, kîmyon, gijînj, hungiv,

darçîn, îsot û rûnê argan û hê gelek tiştên din. Li Fasê bi qasî tajînê xwarineke din a navdar heye, Kuskus. Ev xwarina bi ardik û şîr tê çêkirin xwediyê xwe û gelek şêwazan e. Bi sebze jî bi goşt jî, şor jî şêrîn jî dikare bê çêkirin. Û helbet bêyî hûn şeytanokên(qepûşk) kelandî bixwin venegerin. Xwarinên Fasê wekî tam ne nêzî yên Kurdî ne lê bi têra xwe bi çêj û bi lezzet in.

Berê bajêr ji ber ku li Atlantîkê ye û pêlên zeryayê di her demsalê de zexim û qeyîm in, ji gelek deverên dinyayê turîst, ji bo surfingê bikin berê xwe didin peravên Casablancayê. Li bajêr yek ji berzeqtirîn berhema turîstîk a balê dikişîne mizgefta Qral Hesenê duyem e. Ev mizgeft di mezinbûnê de li cîhanê duyemîn e. Ev mizgefta li peravê zeryayê hatiye lêkirin û ava pêlên zeryayê diwarê wê dialêse, ji bo kesên mîmariya mizgeftan mîraq dikin, dibe ku balkêş be.

Dema wextê xatirxwestina ji Casablancayê tê digel hêviyên xwe yên nîvşikestî, em bi seyareyeke bêpace ya kirêkirî didin ser riya El Cedideyê.



Em hez dikin bi peravê zeryayê re, rêbirê biçin ber bi Agadirê ve. Ji Agadirê jî berê xwe bidin yek ji bajarê herî kevnar û mîstîk ê Fasê; Marakêşê.

### Çar gerok û çîrokek

Em bûbûn çar gerok. Ji ber ku ez berî hemûyan çûbûm Casablancayê, her du hevalên min ên ku me gelek welatên din li bin guhê hev xistibûn, Ferat û Mûrat, jî hevaleke xwe ya bi navê Hacer re ku ew ê jî yekem car dê bi me re derketa rê, di balafirê de behsa min kiribûn. Xwedêgiravî bavê min ji Agadirê, diya min jî ji Parîsê bû. Her du di sosyalîst enternasyonala yekemîn de hev nas kiribûn û piştî evîneke kûr zewicibûn. Ez jî zêdetirî sed welatî geriyabûm, erebiya min pirr baş bû û min Fas jî baş dizanibû. Niha jî ji bo ziyareta bavê xwe ez dê biçûma Agadirê û wan jî xwestibû bi min re werin bajarê bavê min. Sûretê Humprey Bogard û Ingrid Bergman jî wekî ku sûretê dê û bavê min be nîşanî wê dabûn û wê jî gotibû 'bi qasî sûretek ji filmekê be, xweşik e'. Senaryo ev bû. Dema ew gîhaştin otêlê û me hev dît, Mûrat li ber guhê min kir pistepist û bi min da zanîn ku divê ez jî têkeli senaryoyê bibim û vê derewê bidomînim.

Digel ku min zanibû ji mizawirî ev senaryo pekandiye jî, min dilê wî nehiştibû. Heta em bigihêjin El Ceditê, di rê de Hacer a ku min nuh naskirî pirs li ser pirsê ji min kiribûn, bê ka bi rastî jî ew kesê ku Ferat û Mûrat behsê kiribûn yekî rastîn yan derewîn bû. Ji çawa ewqas baş hîni Tirkî û Kurdî bûme bigirin heta gelek pirsên din ji min kiribûn. Min jî wekî yekî ji derewa xwe bawerkirî hemû pirsên wê bersivandibûn. Li her bajarî, wekî ku wî bajarî baş nas dikim tevdi geriyabûm û bi kesên nişteci re jî bi Erebiya xwe ya genî axivibûm. Piştî gereke dûdirêj, em li loqenteyekê digeriyan. Bi israr min digot riya loqenteyê ne li rastê, li aliyê çepê ye û min berê xwe dida wî alî. Piştî li ber hev dan û qayîşkêşaneke dûdirêj a di navbera min û xwediyê derewê de, bi hêrs bi ser min de qêriya; 'kuro ev senaryo bû senaryo û tu jî vî bajarî nas nakî û yekem car e em li vî bajarî ne, bes bi derewan bêje riya rast ev e, ez westiyam bes e!' Dengê wî çûbû guhê Hacerê û bûbû tîqetîqa herkesî û dû re jî ez li xwe mikur hatibûm û min eşkere kiribû ku xwediyê senaryoyê ne ez im. Wekî din riyeke min a din nemabû. Heger min di aliyê riya şaş a loqenteyê de israr nekiribûya dê ew çîrok neqediya :)



Ji bajarokên li ser riya xwe em herî zêde ji Essaouira (Magador) hez dikin. Ev bajarê kevnare yê li peravê Atlantîkê ji berî Hz. Îsa ve heye û di nav listeya kelepura cihanê ya Unescoyê de ye. Xaniyên bajêr seranser bi kirêca spî hatiye seyandin û derî û paceyên bajêr jî bi rengê şîn hatine boyaxkirin. Essaouiraya Fasê bi giştî ji aliyê bûk û zavayan ji bo şîrînmehê tê bijartin.

### **Bajarê Keşmekêşê Marakêş:**

Dema mirov behsa Marakêşê dike berêpêşîn reng tèn bîra mirov. Rengê bajêr sor, çol û toza wê zer, darên fêkiyên wê yên li her derê ji pirteqalî ne. Wekî din a dê neyê jibîrkin keşmekêşa meydana Jeema el-Fnayê ye. Ev meydana kevnare ya ji berî mîladê ve maye mirov bi xwe re dibe sedsalên navîn ê Osmaniyan. Mirovên kumsor ên bi fes li vê bazara mezin tiştên ecêb dikin û difiroşin. Ji yên eylo û teyrên baz difirînin, ji kesên bi bilûra xwe marên kobrayî didin listin, ji qidamfiroşan, ji yên ava pirteqalan diguvêşin, ji bazara serî û pêyên pijandî yê ser vekirî, heta yên çîçikên mirîşkan difiroşin... Her tiştî hûn dikarin li vê bazarê peyde bikin. Şeva sersala 2011an bi 2012an ve girê dide em li vê bazarê ne.

Cambazên agir ji devê xwe diavêjin, şewqa bazarê berztir dikin. Dengê dahol û zirneya li bazarê jî keşmekêşê. Yê ku demekê kurt li vê meydanê bimîne û gêj nebe bizanibin pêlwan e. Piştî çend saetên kaotîk yê li bazarê em xwe bi darê zorê diavêjin xaneke dîrokî. Ev xana kevnare û yextiyarên zengargirtî yên şîşa dikşînin wekî ku hezar sal e bi hev re bin rengê hev girtine. Li vê xanê alkol jî tê firotin. Ji ber ku alkol li Marakêşê li her derê nayê peydekirin ev yek bala me dikişîne. Wexta em ji menyê buhayê wan fêr dibin em lal dibin... Piştî em ji vira derdikevin li meydanê surprîzeke mezin li benda me ye ku hê bi salan em ê ji hev re bêjin û bibilînin. Sahra li başûrê Marakêşê yek ji çolistana herî mezin a parzemîna Efrîqayê ye. Milletê herî qedîm ê vê derê Berberî li çolê kon vedigrin û tûrîstan bi serpêhatiya şev û rojek li çolistanê didin nasîn. Ji ber vê endustriyê, otelên çolê yê konî û bazarên heştiran jî bi nav û deng in li Fasê.

Herçiqaş ji bo nivîseke kovarê welatekî zêde rengîn be jî Fas, li dewsa me hemûyan Canetti têra xwe li vî welatî guhdarî kiriye û berhemeke şahane li ber me daniye. Em cardin fêm dikin ku li çolistana mexribê deng berz e, olan hewce nake!



Li ber meydana Jemaa el-Fnaa - Marakêş





# KEÇIKÊN GUNDÊ ME YOUTUBER IN, TEW LO DILO

1- Li cîhanê Youtubereke/ î ku hûn wê/ wî ji xwe re dikin emsal hene?

2- Hûn bi ekîbekê dişuxlîn an bi tena serê xwe ne? Zehmetiyên karê we çi ne?

3- Dema însan vîdeoyên we temaşê dikin lê nabin abone hûn çi hîs dikin?

4- Tevî ku gelek kes karê ku hûn dikin dîcibînin jî, hin însan "van tiştan" biçûk dibînin û dibên tiştên "beredayî" ne. Hûn dixwazîn ji wan re çi bibêjin?

5- Gelo bi we karên li ser înternetê tesîreke çawa li ser Kurdî dike?

Youtuberên Jin ên Kurd bersiv dan



### ASYA DAWID

Asya Dawid yek ji Youtubera çalak a Kurd e. Ew bi xwe xelkê Rojavayê Kurdistanê ye. Li binxetê û li Mêrdînê xwendiyê. Niha li Mêrdînê dijî û di saziyeke navneteweyî de dixebite. Ji sala 2017an vir ve kanala wê ya Youtubeyê heye. Naveroka kanala Dawid, cûr bi cûr e. Tê de ji mijarên xweşikiyê heta

roportajan gelek tişt hene. Mottoya kanala wê “derbarê jiyane de her tişt” e.

1 - Ehmed Mesad. Youtuberekî Urdunî yi.

2 - Tenê dixebitim. Lê difikirim bi ekîbekê re bixebitim. Çimkî ev kar bi tena serê xwe nabe.

3 - Her kes bi kêfa xwe ye. Ger nexwaze û ji dile wî neyê bila nebe. Tiştêkî hîs nakim.

4 - Ev kar bi tena serê xwe piyaseyek e. Li gorî hinekan baş e û li gorî gelek kesan xirab û beradayî ye. Lê ya muhîm û cuda ku bi Kurdî ye. Niha mesele ne mijar e. Mesele ku kurdî di youtubê de be. Çaxa min dest bi vî karî kir armanca min ev bû. Çi baş çi xirab, wê bi demê re rûnê û em bi tecrubeyan, şaşiyên ku em dikin jî dibînin.

Dixwazim vê lê zêde bikim, yê ku biçûk dibine bêtir temaşe dike

Li ser mesela “ez dixwazim çi bejim?” Hmmm. Wele tu tiştêk.

5 Tesîreke baş helbet. Kurmancî, her ku diçe bi karên cuda û modern di youtubê de belavtir dibe.





### GÎSKA GEROK:

Gulsumakê an jî Gîska Gerok ji herêma Torê ye. 23 salî ye. Li Moskovayê, beşa Zimannasiyê dixwîne. Ji 1ê Berfanbara 2018an vir ve kanala wê li ser Youtubeyê heye. Naveroka kanala wê ewil li ser gere bû lê paşê guherî. Mottoya Gîska Gerok ev e: "Ji malê derket û riya malê wenda kir!"

1 - Ya bi rastî ez Youtuberan bi dil û can naşopînim û dikarim bêjim tu kes nîn e ku ji xwe re dikim emsal. Tenê carnawîlo li hinan dimeyzênim, formatên ku ji aliyê Youtuberên ji welatên din hatine çêkirin dinêrim, ewqas. Dibe ku ev kemasiyeke min jî be...

2 - Ez tena serê xwe dişixulim, lê heke car caran, çaxê videokişandinê li ba min heval hebin, telefona xwe dixim destê wan û dibêjim ka bibin kameramanên min. An jî carna ji bo montajê ji hevalan alîkariyê dixwazim. Zehmetiyên vî karî jî helbet hene, lê ne gelek in yahû, di serî de divê ez bînim

bîra xwendekarên PopKurdê ku mecrayên medyaya civakî cihên nankor in, yanî tu hefteyekê, mehekê tiştêkî bar nekî tu yê bêyî jibîrkirin. Ev tê vê meneyê ku gerek tu her tim bi şopînerên xwe re hin tiştan parve bikî. Nizanim çima lê ez xwe li hemberî şopînerên xwe berpirsiyar hîs dikim û dixwazim tiştên nû biceribînim, heqê şopa wan bidim. Wekî din montaj, amadekirina vîdeoyê filan wext dîstinin.

3 - Ev mixabin di nav Kurdan de gelekî berbalev e. Mesela yek li ba te vîdeoya te temaşe dike, dibê, aa çi qas xweş e. Ez jî dibêim bibe abone naxwe, pêl pişkoka 'abone ol' dike, paşê tirînk, 'oturum aç' dibêje. Hin malxerab hene, hê Gmail'a wan nîn e. Ev pirsgirekeke mezin e. Ev meseleya Gmailê nahêle ku em pere qezenc bikin. Lê ez hêviya xwe ji nifşa nû qut nakim, hêdî hêdî wê ev mesele jî be çareserkin.

4 - Ez ji wan kesên ku karê youtuberan 'piçûk dibînin' û dibêjin tiştên 'beredayî' ne dixwazim bêjim, 'ew roj wê bê û ez ê gelekî navdar bibim û wî çaxî ez ê tiştên beredayî nîşanî te dim!'

5 - Bi navê Xwedê jixwe min ev kanal jî bo belavkirina Kurdî vekir, yanî sedsala ku em tê de ne, sedsala medyaya civakî ye, hema bêje her tiştê ku tê parvekirin û tê ecibandin gelekî zû belav dibe. Kitêbeke Kurdî tê çapkirin lê heta ji cihekî diçe cihekî din helbet wext distîne lê ma vidyoyên me wisa? Maşallah, bi lêza roniyê belav dibin. Helbet wexta wîlo zû belav dibin têsîra xwe jî wenda nakin, hema wîlo germ germ diçin ber destê şopîneran. Li ser meseleya têsîra li Kurdî jî ez dibêim mezin e, dema ku ziman jî malê derdikeve û dibe zimanê jiyana rojanê, zimanê teknolojiyê vê dike ku ciwan bixwazin Kurdî baştir hîn bibin û bi kar bînin. Mesela min hin mesaj stendin, digotin em ecêb man dema ku me li ser youtubeyê, youtubereke Kurd û Torî dîtiye. Ev tiştêkî xweş e, dibe ku hejmara youtuberan zêdetir be, zêdebûna hejmara youtuberên Kurd jî belavbûna zimanê Kurdî ye. (yanî em jî lo gorî xwe hesaban dikin hocam!)



## ROZA SIERRA

Youtuber û Blogger Roza Sierra ji Farqînê ye, nêviya Sêydayê Liceyî ye. Li zanîngeha Artukluyê beşa Ziman û Edebiyat Kurdî dixwîne. Mottoya kanala wê “Berhevkarî” ye. Bala wê li ser folklorê Kurdî ye. Roza sierra gund bi gund digere, di warê folklorê kurdan da çî hebe wan kom dike û li ser kanala xwe ya Youtubê belav dike. Her wiha bloga xwe jî bi awayeke çalak bi kar tîne. Roza sierra bi van xebatên xwe dixwaze ku bibe xwedî arşîveke xurt û çavkaniyeke baş.

1- Wek emsal tune ne lê car caran li formata Youtuberan dinêrim. Yekî tirk heye bi navê Barış Özcan, naveroka vîdyoyên wî gelek baş in. Carinan li kanalên Youtuberên Kurd jî mêze dikim (Resul Bafeyî, Gîsko Gerok, Asya Dawid). Ji bilî formata youtuberan çend rêzebernameyên kurdî jî sêr dikim. Her çiqaş niha ne çalak bin jî. Pencereya Kurdî, Mêvan, Gera Welatê Me.

2- Ekîbeke min tune ye, carinan hevalên min tîn ji bo alîkariyê lê piranî ez tenê me. Wexta ku diçim berhevkarîyê jî pirê caran kameraya xwe didim gundiyan û dibêjim

ka ji bo qeydkirinê pê li vê tûşê bikin, ez ê biaxivim û danasîna vê derê bikim. Pişt re dinêrim ku yan qeyd nekirine yan tenê destê min derketiye yan lingê min. Ez berhevkarî û blogerî û youtuberiyê bi hev re dikim, ev hemû jî wextekî zêde digrin. Gelek dibetilm lê dîsa jî tenêbûn û amatorbûn li xweşa min diçe.

Dema însan vîdeoyên we temaşê dikin lê nabin abone hûn çî hîs dikin?

Vîdyoyeke LoDublajê tê bîra min, Çima! Çima! Çima!

3- Tevî ku gelek kes karê ku hûn dikin diecibînin jî, hin însan “van tiştan” biçûk dibînin û dibên tiştên “beredayî” ne. Hûn dixwazin ji wan re çî bibêjin.

4- Heta niha rastî tişteke wisa nehatim. Hertim ji min re dibêjin, tu karekî pîroz dikî. Bi rastî jî ev kareke cidî ye û barê min jî giran e. Zarok jî ciwan jî kal û pir jî li vîdyoyên min temaşê dikin û parçeyek ji jiyana xwe tê de dibînin. Bi bertekên erênî motîvasyona min xurt dikin, mala wan ava.

5- Tesîreke gelek baş dike û kontaktên kurdî bi hêz dike. Zeman ne zemanê berê ye êdî, her tişt bûye dijîtal. Divê em vê ji bo berjewendîya kurdî baş bi kar bînin. Youtuber û blogerên kurd, kovarên dijîtal, çalakiyên online çiqaş zêde bin ewqaş baş e.



# MEHLA KURDAN



## BORNOZÊ KEVIRBIRÎ WÊ DERKEVE MEZATÊ

Lêkolîner û Nivîskar Salih Kevirbirî, demeke berê, piştî banyoyê, fotoyekî xwe yê bibornoz danî ser Instagramê. Şopînerên Kevirbirî gelek hez ji vî bornozî kirin û bi sedan like û şîrove li ser kirin. Piştî vê eleqê, Salih Kevirbirî qerar da ku bornoz bi riya “Açık Arttırma”yê bide kesekî/ê.

## GELO ZAROKÊ/A WAN DÊ QOSERKÎ BIPEYVE AN MIKSKÎ?

Erol Şaybak û Mizgîn Arslan, vê havînê bi daweteke fantastîk zewicibûn. Li gorî agahiyên ku ji me re hatin, di demeke nêz de wê zarokek ji wan re çêbe. Lê dîsa li gorî gotegotên ku hatin guhê me; di nav malbatê de, li ser du meseleyan nîqaş hene. Tê gotin ku heke kurik be Şaybak dixwaze navê xwe yê berê lê deyne, yanî dil heye navê wî bike Bawer Siyabend û xanima wî jî vê qebûl nake.

Meseleya din jî li ser devoka zarok e. Me bihîst ku Mizgîn xanim dixwaze zarokê/a xwe bi devoka Goserkî mezin bik(!) lê Erol dibêje “heke zarokê/a min bi wê ergatîvîteya berbad biaxive, ez bimrim çêtir e.”



## PORA BANDINÎ

Xwedî, berpîrs û xebatkarê Dara Productionê Dara Bandinî, bi qerareke radîkal tarza pora xwe guhert. Heyran û şopînerên Dara Bandinî bi vê tarza wî bûn du beş. Hinekan got; “Bandinî çi bike lê tê.” Hinan jî got “heyran welle nebûye!”

Tê gotin ku prodûktorê navdar, ev demek e di “bunalim”ê de ye û xwestiyê bi vî awayî pariyekê bê ser hemdê xwe.



# MIRIN STARA VÊ DINYAYÊ YE KURD Û ÎNTIHAR



Kezala Redkanî  
kezale1905@gmail.com

Xwînerên ezîz ên PopKurdê; bi rastî dema min ev serenav nivîsî, ez zehf tengezar bûm! Em li Rojhilata Navîn dijîn. Ji ber vê em milletekî gelekî hestiyar in. Meyla me ya xwekuştinê li ser tayekî ye. Wê dû re bibêjin, ev keça hanê çi ji me dixwaze? Çima dev ji me naqere? Em çima xwe bikujin? Na na, wisa nekin! Mirin ne ewqas hêsan e! Canê mirov şêrîn e! Jiyan xweş e! Kanî em şeraba Suryaniyan vexwin.

Di warê zanistê de gelek pêşveçûn, her roj bi nûçeyan li çavên me dikevin. Bi gotineke din, zanist gavên mezin qelaştiye. Her dem mirov bo mirinê li çareyan geriyane. Dema meriv bala xwe dide dîrokê gelek hikayet li ser mirinê hene ku her çiqas ji rastiye dûr bin jî her tim însan mereqa van kiriye. Mînaka Loqmanê Hekîm hema hema li her derê cîhanê tê zanîn ku dermanê mirinê li bal wî hebû lê rojek ji rojan Loqmanê Hekîm dema li ser pirekê dibuhure bagerek tê û hemû wan kaxezên destên wî li ba dibin û wenda dibin. Dîsa li gorî galegalan kî ji hezar golên Çewligê avê vexwarana tu carî nedimirî. Di warê mîtolojî û olî de jî gelek rîwayetên bi vî rengî hene ku meriv dikare lê zêde bike. Lê mixabin van rîwayetan ber dilê me tu carî negirtine.

Di nav xirecira jiyanê de dema xeberek ji me re tê ku dibêjin wa ye filankes çûye

rehma Xwedê yan jî bêvankes xwe kuştiye, meriv matmayî dibe ku xwîn nahere mejiyê meriv. Yan jî aqilê meriv çeqlomeqlo dibe bê ka em ê li ber bûyereke wisa çawa bertek nîşan bidin. Pirê caran em li ber xeberên wisa dibêjin: "Ma emrê Xwedê kiribû." Yan jî heger yekî/e giregir an navdar be mirov dibêje: "Dinya dê hinekî din tarî bibe." Helbet mirina her kesî jî ne mîna hevdû ye. Dema yekî "ji rêzê" dimire helbet dilê mirov "kêmtir" diêşe lê dema em mirina kesekî navdar dibihîzin tesîra wê zêdetir dibe li ser me.

Wekî ku me li jor jî got, mirina her mirovî heman bandorê li ser meriv nake. Çimkî bivê-nevê jiyana şexsî yanî serboriya wî ya jiyanê, bandorê li ser mirina wî jî dike. Wek nimûne, mirina Mixtarê 'Ernasê û ya Yasenîn an jî mirina Hecî Cemîlê Bêcirmanî û ya Dost Çiyayî heman bandorê li ser heval û hogiran nake. Serboriya wan a civakî û ya jiyanê ne nola hev in. Mixtarê 'Ernasê her çiqasî bi îroniya LoDublajê nav û deng dabe jî şana wî nagihîje tesîra mirina stranbêj, nivîskar an helbestkarên mîna Dost Çiyayî, Sadiq Hîdayet, Mihemed Şêxo, Yasenîn, Celadet 'Elî Bedirxan, û hwd.

Ji kerema xwe bala xwe bidin pêvajoyên Herba yekem û Duyem a Cîhanê bê çi kam-baxî qewimiye. Bi taybetî dema meriv bala



Şikoyê Hesen

xwe dide edebiyata cîhanê, di maweya van şeran de, belkî jî ji ber derûniya şer gelek întiharên sosret çê dibin,.. Belkî jî stranbêj, helbestkar û nivîskarên cîhanê hemûyan têgihîştine ku êdî nekarin bi pênuş û qelema xwe kambaxiya vê jiyane biguherînin û bi destê xwe dawî li jiyana xwe anîne.

Em dikarin çend nimûneyan jî li ser van întiharên bidin.

Yasenîn, di Berfanbara 1925an de li hoteleke Lenîngradê zendê xwe jê dike û bi xwîna xwe van ristan dinivîse:

“bi bêdengî, bi xatirê te hevalê min me xatir ji hev nexwest

Tu xemgîn nebî ha!

Li vê dinyayê mirin ne tiştêkî nû ye

Jiyan jî ne tiştêkî nû ye.”


Virginia Woolfa ku ewqasî di bîra femînîstî ya cîhanê de navdar e, di sala 1941an de diçe ber çemekî, bêrika xwe tijî kevir dike û xwe di nav avê de difetisîne.

Sadiq Hîdayetê îranî jî belkî bi heman hestan xwe kuştiye. Wî jî li Fransayê bi rojan li daîreyeke bigaz geriyaye. Serê xwe xweşik şûştiye, bedlê xwe li xwe kiriye, porê xwe şeh kiriye, gaz vekiriyê û li ser somyayê rûniştiye û bi wî hawî xwe kuştiye.

Dîsa Sylvia Platha ku mirov qiyimîş nedikir li bedewiya wê binêre, ji ber êş û elemên rûhî întihar kir.

Cesare Pavese, 69 sal berê li Torînoyê, li odeya otelekê 21 heb îlacên xewê dixwe û întihar dike. Beriya xwe bikuje li ser kaxeze-kê vê notê dinivîse: “Êş, sibehan jî dinuximîne êdî.”

Em dikarin mînakên zêdetir bikin lê ez dixwazim gotinê bînim ser entelektuel, nivîskar, şa’ir û stranbêjên me. Trajediya jiyana Mihemed Şêxo ne kêmi ya Jim Morrison bû lê Şêxo tu carî xwekuştinê nefikirî mesela. Li bînxet, di nav sefaletê de ji birçînan mir stranbêjê me yê qedirbilind.



Dost Çiyayî

Mirina Şêxo gelek tesîr li Dost Çiyayiyê helbestkar dike. Di sala 1992an de êşa gurçikan li Dost Çiyayî hasil dibe. Du caran emeliyat dibe. Bi enfeksiyona jehrbûna xwînê dikeve komayê. Di demeke ku her kesî jê hêvî birrî de li nexweşxaneyê yeke hemşîre nas dike û dil berdidê ku wî li jiyane vedigerîne belkî. Ev veger bandoreke mezin li ser wî dike. Dost Çiyayî di sala 2003an de, di qezaya trafîkê de jiyana xwe ji dest dide.

Dîsa mîsal êş û kederên ku Celadet Bedîrxan dîtine ne kêmi yên Stefan Zweig in. Lê ew jî tu car nê nake ku dawî li heyata xwe bîne. Li Şamê bi çandiniyê re mijûl e. Rojekê piyê wî dişemite û dikeve bîrê û diçe ber rihma Xwedê. Dîsa li gorî Tosinê Reşîd:” Şikoyê Hesen ne merivê vê cîhanê, vê derwanê bû. Wî nikarîbû qelpiyê bike. Zanibû jî li diniya dor wî qelpî serdest e û dixwast jî qelpiyê bike...” helbestkarê navdar Şikoyê Hesen di sala 1976an de dawî li jiyana xwe aniyê. Bi qasî ku em dizanin ji bilî Şikoyê Hesen û Dr. Rodî nivîskar û şairên Kurd întihar nekirine. (Xwedê wan bi rihma xwe





Sylvia Plath

şa bike)

Pirs jî li vir dest pê dike jixwe.

Diya min tim digot "Mirin stara vê dinyayê ye." Lê gelo tevî ev karesatên ku ev nêzî sed sal in li Kurdistanê diqewimin, çima edîb û helbestkarên Kurd qet berê xwe nedane vê starê û întihar nekirine. Êdî qet debar nekirine û negotine "mirinê tu li ku yî? Jiyanê ez kuştim!" Gelo dibe ku ji vê şerm kiribin û gotibin "eyb e law, wê xelk paşê li pey me çi bibêje?" Çimkî di nav Kurdan de ew çanda şermê heye. An jî wan hêj hêviyên xwe ji dest nedane? Bawer dikin ku dê bi qelemê karibin vê qederê berovajî

bikin. Di van salên dawiyê de yê ku herî nêzî întiharê bû birêz Firat Cewerî bû. Wî jî paşê qerar da û got; ne xwe lê "ez ê yekî bikujim." Rênas Jiyan jî demekê got: "dimirim îro, ne di nivê şevên gurxenêq de, ro li nivro" lê Şikir baş e niha. Yanî bi kurt û Kurmancî wekî gelek meseleyan, di vê meselê de jî em ji milletên dinyayê kêmtir in. Ditirsim piştî vê nivîsê sibê em di Bianetê de bi îmzeyaya Mirad Bayram, nûçeyaya xwekuştina şa'ir an nivîskarekî Kurd bibînin. Bê lome be. Niyeta min ne xweşkirina întiharê ye, tenê meraq □

# ME JI ŞA'IR Û NIVÎSKARAN PIRSÎ:

Ger hemû heyata  
te hevokek bûya,  
dê kîjan bûya?

**Eta Nehayî:** Eger min xem û meynetiyên xwe, li ser karakterên çîrok û romanên xwe belav nekira, min ê nikaribûya jiyana xwe berdewam bikira.

**Shahab Wali:** “Hasilî emrim xam budem, puxte şodem, sûxtem.”

**Meral Varışlı:** “Em du xerîb in di gerîneka zemên de.”

**Ömer Dilsoz:** Çima gelo ev heyat li min tê heyhatê...

**Hamid Omerî:** “Tîna min li ser vî erdê bejî naşkê lew bi qasî şanika li gerdena wê tenha me.”

**Ergin Öpengin:** “Ho lawjeya zelal a bedbextiyên nû.”

**Recep Dildar:** Evîn li ser axa bav û kalan, bi zimanê dayîkê di nav azadiyê de xweş e.

**Firat Cewerî:** Gava jiyana rastî li min dibe zîndan, ez jê bi firê dikevim û bi lehengên romanên xwe re di cîhana xeyalî de dilivim.

**Mem Zinistani:** Dereng e!

**Ciwanmerd Kulek:** Ger hevokeke wisa hebe, naxwazim wê bizanim.





# KURDÊN JAPONYAYÊ



**GERÛGEŞT**

İbrahim Genç

[brhmgnc1@gmail.com](mailto:brhmgnc1@gmail.com)

Her çiqas Japonya gelek dûr be jî, derbarê vî welatî de herkes xwedî nêrînekê ye. Hin kes hene bi xêzefilma Tsûbasa, ku di salên 90î de gelek navdar bû, dizanin. Bawer dikim tê bîra we jî ku Tsûbasa dida pey gogê, lê heta çaleya din qet rê xelas nedibû. Hin kes jî hene rêz li jêhatîbûn û zîrektiya wan digirin. Jixwe dema ku behs ji Japonan vedibe, ew kêsên li cîhanê pîrr digerin û wênayan dikşînin tê bîra mirov. Ji ber vê yeke, Japonya li hemû cîhanê tê meraqkirin. Lêbelê dema ku mijar Kurdên me yê Japonyayê be, ew meraq zêdetir dibe.

Eger hûn bixwazin biçin Japonyayê bi tenê hewcedariya we bi pasaportekê heye. Lewra ji bo Japonyayê heta sê mehan vîzayê xwestin. Her çiqas çûyîn hêsan be jî, li wê derê bicîhbûn û jiyan gelek zor e. Herwiha welatekî gelek biha ye. Jixwe Tokyo li cîhanê di nava paytextên herî bihatir de tê qebûlkirin. Ango ji bo gereke tûrîstîk divê di berîka we de pere hebin. Ji aliyekî din ve heke hûn ji ber pirsgerêkên aborî an zextên

siyasî tengijîn û hûn dixwazin demildest xwe biavêjin Tokyoyê, bi rastî ne zehmet e, lê li gorî makezagona Japonyayê stendina mafê penabertiyê qet ne hêsan e.

#### Welatekî Rêzikperest

Dema ku ez çûm Japonyayê bihar bû. Ez ji bo Konferansa Navneteweyî ya Kurd a Yekem hatibûm vexwendin. Min ji balafirgeha Narîtayê heta navenda Tokyoyê bi çavên meraqdar li dor xwe mêze dikir. Çi bajarekî mezin û paqij û bi pergal e, star ya Rebbî! Lê divê ez îtiraf bikim ku her der zêde beton bû. Di vî warî de em nikarin bi paytextên weke Londonê re muqayese bikin. Lê weke hûn jî dizanin ku Japon gelek rêzikperest in. Li ser meselê; hûn nikarin li ser kolanê di destê we de cixare bimeşin. Lewra ji bo kişandina cixareyê cihên bi navê "Smoke space" hatine çêkirin.

Yeka din, min dît ku li ber devê gelek Japoniyan maske hebû. Ez fetilim hevalê xwe û min jê pirsî, "Ev mirov hemû nexweş in?"





Hevalê min keniya û got, “Na na, dema ku kî tê heyirî dimîne, lê ew ji bo alerjî û nexweşîyan bi vî awayî xwe diparêzin. Belê xaniyên Japonan jî gelek piçûk in. Lewma dema ku tîrkiyeyê xaniyên vir bi wan wekî qada futbolê ye. Di rêwîtiya tu welatî de mirov behsa avdestxaneyan nake. Eyb e, şerm e! Lê ferqa Japonyayê heye, wekî bi Tirkî dibêjin “Japon îşî”. Li Japonyayê hemû klozet tam otomatîk in. Li ser klozetê ew qas bişkok hene ku tu dibêjî qey ev panela kontrolê ya keştiya fezayê ye. Lê belê bi taybetmendiyên balkêş gelek rehet in.

## Ha Sûshî, Ha Çîgê Goşt

Li Japonyayê her çiqas hinek Bûdîst hebin jî bi gelemperî Şîntoîst in. Rîtuêlên Şîntoîstiyê, di gelek malan de tîr domandin. Jixwe Japonya bi kevneperestîya xwe tê zanîn. Ewqas balkêş e ku li wir kevneperestî û modernîzm bi hev re dimeşin. Dema ku ez li Tokyoyê çûm herêma Asakûsayê jî kevneşopiyên wan hema bi ber çavên min ketin.

Asakûsa weke cihekî herêma perestgehê tê binavkirin. Ciwanên Japon ên ku nû ketine salên 20î, cil û bergên xwe yê bi navê “Kimono” li xwe dikin û tîr wê derê. Ji bo wan merasîmek tê lidarxistin. Ji vê merasîmê re “Seijin no Hi” tê gotin. Kesên wekî min ên tûrîst jî diçin bi wan ciwanan re wêneyan dikşînin.

Bi rastî di nivîseke geşt û guzariyê de behsa mitbaxê neyê kirin nabe. Îro restorantên Japonyayê yê wekî Coco Ichibanya li seranserê cihanê deng vedane. Her çiqas mitbaxa Japonyayê bi xwarina Sûshî tê nasîkirin jî, gelek şîv û xwarinên wan ên cûrbecûr hene. Ez li Sîngapûrê çûbûm restoranta Coco Ichibanyayê. Jixwe li wê derê mitbaxa herî navdar, a Japonan bû. Min li Sîngapûrê jî, Tokyoyê jî û li Tirkîyeyê jî gelek caran Sûshî xwar. Ji ber ku ez Rihayî me, her tim çîgê goşt (Çîgkofte) dihat bîra min. Ew masiyên xam dixwin, Kurdên me jî goştê xam. Ango li Tokyoyê Kurdek çima dikaneke çîgê goşt bi navê “Kurdish Sûshî” ve-nake nizanîm. Ji xeynî Sûshî, kêfa min gelek



ji şîva Japon Kurî re hat. Eynî tirşika me ye, lê baharat maharatên wan gelek cuda ne. Ji bo Kurdên me yên ku miriyên çaya qaçax in, ne agahiyeke baş e, lê divê ez bibêjim; li Japonyayê çay-may bi hêsanî nayê dîtin. Lewra ew çaya kesk vedixwin.

#### Warabistana Kurdan li Japonyayê

Ez hîs dikim ku xwînerên PopKurdê niha dibêjin gelo ev nivîskar çima nayê ser mijara Kurdên Japonyayê. Ew jî mafdar in, lê mirov di nava jiyana balkêş a Japonan de xwe wenda dike. Bi tena serê xwe hebûna Kurdan bi rastî bala mirov dikişîne. Bi rastî em dikarin bibêjin ku çûyina Japonyayê ya Kurdê yekem bi xeletî an mecbûrî bûye. Ez bêjim, qîrarê hûn bidin. Kurdekî me yê ji Pazarcixa Mereşê, di sala 1992an de ji ber zexta dewletê dixwaze biçe Ewropayê. Lê li Ewropayê bi cih nabe. Neçar dimîne û berê xwe dide Awustralyayê. Ji ber ku welatekî dût e, divê di ser Japonyayê re biçe, tê Japonyayê û nikare ji wir derkeve. Roj ew roj e Kurdên me li wir zêde dibin. Lêbelê di serî de, ji ber ku Japonî nayê zanîn, ji alfabeya Kanjî tu tişt nayê fêmkirin û makezagona Japonyayê ji bo penaberan gelek xirab e, pirr zehmetiyê dikşînin.

Piştî ku Kurdên ewil li wê derê cihê xwe çêdikin, Kurdên me hêdî hêdî berê xwe didin Japonyayê. Kurdên me jî nêzikî Tokyo-yê, li dor bajarokên Kawagûchî û Warabiyê ku li ser wilayeta Saîtamayê ne, kom dibin. Ji ber ku ev der wekî “Taxa Kurdan” tê naskirin, gelê Japon ji ber peyva Kurdistanê, ji vê taxê re dibêje “Warabistan.” Li Warabistanê gelek dikanên Kurdan ên xwarin û vexwarinê hene. Niha nêzikî 2000 Kurd li Japonyayê dijîn. Ciwanên Kurd herî zêde di karê înşeatê de dixebitin. Heta ku ji aliyê Kurdan ve zêdetirî 50 şîrket jî hatine saz kirin. Lê ji ber ku statuya hemwelatîyê nehatiye bidestxistin, bi piranî ew şîrket bi hevkarîya Japonêkî tên saz kirin.

#### Kurd Çawa bi pêş ketin?

Li japonyayê ji bo Kurdan pirs girêka herî mezin ew e ku statuya wan a penabertîyê tune ye. Ji ber vê yekê, gelek Kurd bi mehan di girtîgehê de dimînin, gelek Kurd jî bi tenê xwediyê vîzeyên şeş mehî ne. Divê şeş mehan carê ji Japonyayê derkevin û dîsa têkevin. Ew jî “ara formul” a Japonan e. Gelek Kurd rasterast ji mafê perwerdehî û tenduristiyê nikarin îstifade bikin. Lê bi şiklekî çare tê dîtin. Belgeya ku jê re dibêjin “Karîhomen” heye. Lê ev belge nayê mehna



ku mirov xwediyê statuya penabertiyê ye. Penaberên xwediyê Karîhomen in lazim e çend mehan carekê biçin belgeya xwe nîşanî Ofîsa Penabertiyê bidin.

Lê Kurdên Japonyayê jêhatî ne. Bi taybetî jî piştî ku Kurdên zana û xwenda di sala 2010an de diçin Japonyayê rewş diguhere. Bi hewldanên Mamoste Vakkas Çolak û hevalên wî, di sala 2013an de Komeleya Çanda Kurdî, Li Japonya vedibe. Bi saya vê komeleyê, Kurd him bi rêxistinî tevdiğerin him jî ji aliyê perwerdehiyê ve xwe bi pêş dixin. Lêbelê gelê Kurd herî zêde piştî sala 2014an, bi şerê diji DAÎŞê bala raya giştî ya Japonan dikşîne. Ji ber vê yekê gelek caran li ser Kurdên Japonyayê, di TV û rojnameyên Japonî de nûçeyên berfireh hatine weşandin.

Li bajarokê Warabî, rayedarên Kurd ji bo perwedehiya Kurdî daxwazên xwe ji şaredarê wir re çend sal berê gotibûn. Her çiqas ew daxwaz nehatibe cih jî, li gelek zanîngehan derbarê Kurdan de semîner tîn dayîn. Jixwe çend mehan berê zimanê Kurdî li Zanîngeha Lêkolînên Zimanên Biyanî ya Tokyoyê di mufredatê de cihê xwe girt. Îro li hin zanîngehan “Yekîtiya Xwendekarên Kurd Li Japonyayê” hatiye avakirin û em dikarin bibêjin ku hemû endamên wê xwendakerên japonî ne. Ji xeynî vê, Komeleya Dostaniya Kurdistan û Japonyayê jî bi awayekî çalak dixebite. Ev komele ji aliyê Japonan ve hatiye avakirin û armanca wan a sereke pêşxistina peywendiyên Kurd û

Japonan ne.

Kurd wê xwe bidin qebûlkirin

Niha di parlamentoya Japonyayê de ji aliyê parlamenterên Japonî ve “Koma Dostaniyê ya Navparlamentoyan a Kurdistan – Japonya” jî hatiye avakirin. 12 parlamenterên Japonî endamê koma dostaniyê ne. Karsazekî Japonî Kinoshîta Akînobû jî him sekreterê giştî yê vê komê ye him jî dîrektorê komeleyê ye. Akînobû Kînosshîta, hosteyê şûr e û bi eslê xwe samûray e. Ji xeynî wî rûspiyekî Japon Okîsûke Toyama jî ji bo Kurdan xebatên dîplomatîk û aborî dimeşîne. Bavê wî Mitsûrû Toyama jî ku siyasetmedar, feylesof û serokê dînî bû, di serdema Meijî de ji bo azadiya gelên bindest xebitiye. Ji ber van rêxistin û xebatan, ev çend hîlbijartin e ku HDP li Japonyayê dibe partiya yekemîn.

Gelek caran bi organizasyona van rêxistinanan di navbera ciwanên Kurd û Japon de pêşbirkên futbolê jî tîn lidarxistin. Her wiha Kurd û Japon li taxan bi dildari bi hev re paqijiyê dikin. Jinên Kurd jî mehê carekê çalakiyên wekî “roja mitbaxa Kurdan” li dar dixin û bi jinên Japon re xwarinên Kurdan çêdikin. Ev hemû xebat ji bo pêşketina tîkiliyên Kurd û Japonan û entegrasyonê girîng in. Em nabînin, lê gelek rewşenbîrên Japonî hene ku li ser erdnigarî, muzîk û çanda Kurdan dixebitin. Ev jî diyar dike ku Kurd li her derê di warê tîketina objektiva cîhanê de bi ser dikevin.



# POP

# N Ū Ç E

Alexandre Tansman

**LA NUIT KURDE**

Drame lyrique en 1 prologue et 3 actes


reduction pour chant et piano

## Çakarê Operaya Kurdî ya Wenda Dît

Sopranoya kurd Pervîn Çakar piştî gelek xebatan, notaya operaya Alexandre

Tansmanî ya bi Kurdî bi dest xist. Navê operayê “Şeva kurdan” e. Çakarê got: li gorî lêkolînên min, yekem operaya li ser kurdan hatiye amadekirin ev e.

**SÎNEMAYA SERBIXWE** | Hejmar 1  
Berfanbar  
E-Fanzîna Sînema, Çand û Hunerê | 2018



Ji bo civakê  
Ji bo Hunerê  
Ji bo Jiyanê  
Sînema...

## E-Fanzîna Sinemaya Serbixwe” Hat Weşandin

E-Fanzîna bi navê Sînemaya Serbixwe, piranî li ser sînemayê hûr dibe û di warên din de jî nivîs wê bèn weşandin.



# KEMAL KAHRAMAN

“Ji bo qada nivîsê  
Gilgamiş çi be, ji  
bo çanda devkî jî  
Şahmeran ew e.”



**HEVPEYVÎN**

Rûken Hekaryan

[ruken.ilishekaryan@gmail.com](mailto:ruken.ilishekaryan@gmail.com)





Dema ku Muzîka Dersimê-Zazakî tê gotin yekser navê Metîn Kemal Kahraman tê bîra mirov. Rûken Hekaryan, li ser muzîka Zaza-Elewî û xebatên wan ên muzîkê li Mêrdînê bi Kemal Kahraman re roportaj kir.

**'JI BO QADA NIVÎSÊ "GILGAMIŞ" ÇI BE, JI BO ÇANDA DEVKÎ JÎ "ŞAHMARAN" EV E.'**

- Piştî demekê we berê xwe da muzîka Zazakî. Tu dikarî ji me re behsa pêvajoya muzîka Metin Kemal Kahraman bikî?

"Di salên 90î de, bi hin komên muzîkê yên Tirkî re me stran gotin. Piştî demekê me ji xwe re got 'gelo em çima bi zimanê xwe muzîkê îcra nakin?' Me xwest li şûna stranên kevn, em yên nû çêbikin. Çimkî gelek kes wisa difikre ku Kurmancî-Zazakî tenê li gorî muzîka folklorîk e. Yanî bi însanan re fikreke wilo heye ku bi enstruman û melodiyên modern muzîka Kurdî nayê çêkirin. Me xwest em vê bişkinin. Te-crubeyeke me jî hebû. Helbet heta ji me hat

me çanda devkî jî berhev kir. Albuma "Deniz Koydum Adını" Tirkî û Zazakî derket. Yanî dixwazim vê bibêjim ku ji nişka ve çênebû. Pêvajoyek bû."

- Folklor û çanda derdora Dêrsimê piçek "girtî" maye sankî. Xebatên we yên berhevkarîyê yên li vê herêmê çawa dest pê kirin û niha di çi astê de ne?

"Me dizanîbû ku Zazakî bi çanda devkî hatiye û gihaye roja îro. Em çûn cem kal û pîran. Me ji extiyaran gelek tişt berhev kirin. Çîrok, zêmar, stran.. Çi hebin me ji wan guhdar dikir. Me ew qeyd kirin. Çimkî rewşa Zazakî xirab e û her ku diçe winda dibe.. Lazim e bihata qeydkirin. Di sala 1995an de, albuma me ya ewil a dokumantariyê derket. Navê wê "Extiyarên Me Kilamên Dêrsimê Dibêjin" bû. Di sala 2000an de albuma me ya "Surela" derket. Di vê albumê de me bi extiyarên Zaza re kilam gotin. Di 2006an de albûma me ya "Çevere Hezerû" derket. Tê de li ser rîtuêlên Kurdên Elewî gelek kilam hene."

### “DÊRSIM NAVENDA “MENEYÊ” YE.”

- Dêrsim di cîhana Metin Kemal Kahraman de teqbulî çî dike?


“Dêrsim hafizaya Elewîtiyê ye. Elewîti jî hafizayeke pir muhîm e ji bo vê axê. Karl Marks dibêje dînamîka sereke ya dîrokê nakokiya di navbera “ked û sermayê” ye lê na! Bi me dînamîka herî sereke micadeleya di nabeyna “hêz û me’neyê” de ye. Elewîti di vî şerî de li aliyê “meneyê” ye. Mixabin tarîx hertim piştî “hêz”ê girtiye. Dêrsim navenda “meneyê” ye.

- Niha xebatên we li ser çî ne?

“Niha em li ser xebatekê hûr dibin. Ew jî li ser “zêmarên politîk” e. “Zêmarên Politîk” çî ne? Ji dema osmaniyên heta îro, Dêrsimiyên li ser kesên ku di herban de mirine, kîjan zêmar gotine; em niha wan berhev dikin û li ser wan disekin. Yanî xebateke dokuman-tar a Zazakî ye. Zêmar, tarîx bi xwe ye, tê de hemû hadîseyên wê demê hene.”

- Em behsa albuma Şahmaranê bikin, dibe?

“Çîroka ‘Şahmaranê’ ji bo me gelek muhîm e. Dema behsa Şahmaranê dibe 3 cihên bîra me. Mêrdîn, Dêrsim û Tarsûs. Li van her sê bajaran jî bo fêmkirina Şahmaranê materyalên xurt hene. Şahmaran ne hikayeteke ji rêzê ye, meseleyeke pir mezin e. Ji bo dîroka çanda van axan gelek girîng e. Ez hertim dibêjim ‘ji bo qada nivîsê Gil-



gamiş” çî be, ji bo çanda devkî jî “Şahmaran” ev e.’ Em vê jî dibêjin; hafizeya devkî, jî ya nivîskî zelaltir û kûrtir e.”

### “MUZİK HERÊMÎ YE”

-Bi giştî hûn li ser muzîka Kurdî çî difkin?

“Ez bi xwe ji têgeha “muzîka Kurdî” an “muzîka Tirkî” an jî “muzîka etnîk” hez nakim. Bi ya min muzîk herêmî ye. Li ser meselê; li Botanê jî li Dêrsimê jî bi Kurdî muzîk tê îcrakirin lê meqam û melodi-yên wan jî hev gelek cuda ne. Mîsal koka meqamên muzîka Dêrsimê “Huseynî” ye. Li Mêrdîn jî bîngeh, meqamê “hîcaz”ê ye.

- Li sar saziyên Kurdan tu yê çî bibêjî?

“Saziyên me mixabin ketine teşqeleya derengmayînê ne. Mîsal di meseleya termînolojiya muzîkê de, li gorî xwe hereket dikin. Bi Kurdiyêke çêkirî têgehan ava dikin. Ev bobelateke mezin e. Lê nakolin, naçin li gundan nagerin, ji xelkê napirsin. Îro wezîfa me ya sereke ev e: lazim e em gotinên dê û bavên xwe tespît bikin, bêyî ku biguherînin em wan arşiv bikin.”

- Dikarî navê çend muzîsyenên Kurd ên ku tu guhdarî dikî bibêjî?

“Ka ez kîjan bibêjim, helbet gelek in lê jixwe Ciwan Haco heye. Ez Xalit Tarî dicibînim, him muzîka wî him jiyana wî. Wekî din Mehmet Atlî heye û hêj gelekên din...”

# SWÎNG Û AMED: LI PEY 'DANSA HERÎ BIKÊF A DINYAYÊ'



İnan Erođlu  
[inan.eroxlu@gmail.com](mailto:inan.eroxlu@gmail.com)



Ji wesayita nav bajêr peya dibim û ji serê meydana Deriyê Çiyê ber bi Diyar Galeriayê ve dimeşim. Ez dê tev li dersa xwe ya li Swîng Amedê bibim. Kêfxweş im ku dinya hinekî din vebûye û ji wê guşîna baranê tenê peşkên wê mane. Li vê rewşê diheyirim û wan seferên xwe yên berê di bîr tînim. Ew seferên ku her cara ji Bismilê dihatim Amedê, barekî giran ê baranê raselitî ser min dikir.

Bi têtetina hundirê Diyar Galeriayê re wekî her carê berê xwe didim nêrdewana otomatîk a li çepê. Nizanim çima, ev nêrdewan qet naşixule. Qatekî hildikişim, cardî berê xwe didim çepê. Dû re berê xwe didim rastê û rast ber bi dawiya korîdorê ve dimeşim. Dengê tê min, ev dengê “Sugar” a strana Hot Sugar Bandê ye. Ji studyoya dansê ya Swîng Amedê bilind dibe. Dibînim ku şagirtên nû destpêkirî yên Koma E’yê li ber vê stranê ji dersdarên xwe hînî gavên ewil ên dansê dibin.

Tam li hemberî studyoya Swîng Amedê, ofisa rojnameya Şûjinê heye. Her carê çavê min bi qeflên deriyê wê dikeve. Ew bi KHK’yê hatibû girtin. Li qata jêrê Şanoya Bajêr a Amedê heye, li jorê jî Sînemaya Bajêr. Ev hevsengiya di navbera şano-dans-sînemayê de, bi her têtetina min a bo Diyar Galeriayê re, min heyran û ecêbmayî dihêle.



Wêne: Nurhayat Çelik

### ‘Min keşif kir ku ev dans çiqas xweş û azad e’

Berî ku dersa koma me ya D’yê dest pê bike, bi Arda re dipeyivim. Ew yek ji endam û berpirsiyarê Swîng Amedê ye. Endezyarê

înşaatê ye û di heman beşê de doktorayê dike. Arda di 2017an de dest bi vê dansê dike û ew ji koma ewil (Koma A’yê) a civata Swîng Amedê ye.

Li gorî Arda; çawa ku her kes govendê digire, divê vê dansê ji bike. Armanca wan a Swîng Amedê ew e ku hejmara xwe ya mirovan zêde bikin, vê dansê bi Amediyan bidin naskirin û ji nav xwe dersdarekî dansê bidin peydakirin. Gava jê dipirsim ka sebeba tevlêbûna wî ya dansê çî ye, ji min re dibêje ku sebeba wî ya serê ewil cihêrengî, deradetî û nayzanîniya vê dansê bû.



Wêne: Doğan Irmak

“Mirov piranî behsa dansên derveyî govendê, derveyî yên Amedê dikin, Tangoyê, dansên Latîni bêtir dizanin. Dansên Swîngê li vir pir kêr dihat zanîn û fikra kêr kesan li ser vê dansê hebû. Ez vê dansê hîn bûm lê piştî wê êdî ew bû xwedî wateyeke cudatir. Her cara ku min ev dans teqîb kir, temaşe kir û hîn bûm, min keşif kir ku ev dans çiqas xweş û azad e.”

### Ber bi şevbuhêrkên partiyan ve

Ez derbasî studyoyê dibim, dersa me dest pê dike. Dersdarên me, Nazlı û Hakan ji Stenbolê hatine. Ew li Swîng Istanbulê dersdariyê dikin û ji avakirina Swîng Amedê û vir ve her car tîn dersê didin. Dersa min a duyem an jî sêyem e dibêjim qey. Bi hevalên din ên komê re hînî hereketên nû dibim. Gava hereketan zû ji hev derdixim pir kêfxweş dibim. Gava zû bi zû fam nakim û hîn nabim jî, bi ekseke tûjtir hewl didim heman hereketan ji nû ve rast û dirist çê bikim.

Piştî dersê, di saet 7ê êvarê de li Leman Kulturê partiya Swîng Amedê heye. Cuda-hiya partiyê ji pratîkên li studyoyê ew e ku mebest ne hînbûn lê bi temamî stendina kêf û zewqa ji dansê ye. Mesela ez li partiyê nikarim ji tu kesî bipirsim ka ev gav, hereket çawa çê dibe, rast e yan na. Loma wekî partiya berê, ez dê li wê partiyê jî van tiştan ji kesî nepirsim. Ez dê tenê li kêfa xwe binerim, şaş yan jî rast, qet ferq nake.

Adet ew e ku di van partiyan de her kes cilûbergên xwe yê wekî yê wê serdema Swîngê li xwe bike. Bi qasî dibînim, ez jî tê de, hin heval li gorî vê adetê tevnagerin. Bi ser de papyona me jî tune, heqê me çî ye, dizanim.

Bi qasî sî çil kes em hene li partiyê, şeveke geş xuya dike. Her kes yan dixwe, yan vedixwe yan jî dansê dike. Ez jî nasekinim helbet. Heta ji min tê hemû xanimên delal û hêja radikim bo dansê, yan jî ew min radikim. Carinan gazinan jî li min dikin ku ew neyên min ranekin, ez jî cihê xwe ranabim naçim wan ranakim. Loma ez hewl didim çapik û çalaktir bim.



Wêne: Nurhayat Çelik

Ber bi dawiya partiyê ve du dansên komî bala min dikişînin. Yek ji wan “jam” e, xe-lekek tê çêkirin û her kes bi kesê nav xekekê re dans dike. Îşev Tewfîq di nav xekekê de ye û her kes pê re dans dike. Ji ber ku ew dê ji me veqete û biçê Stenbolê. Roja ku nû tev li dersên Swîng Amedê bûbûm, dersdara me Nazlı piştî dersê ji min pirsibû ka ez çend salî me. Min jê re gotibû, “Ez îro bûm 24 salî.” Gotibû ku xwezî te bigota, ji ber ku

her kes dê hingê bi min re dans bikira. Min wê rojê fam kir ku bi rastî jî “jam” danseke fewqalade xweş e.

Dansa din, “snow ball” e. Cardî xekekê heye, pêşî ez û dersdara me Nazlı dest pê dikin dansê dikin. Pişt re hevalên me ji nişka ve dibêjin “snow ball” û em vediqetin, her yek ji me partnerek ji xwe re dibîne. Heta ku tu kes namîne, “snow ball” tê gotin û her kes bi hev re dansê dike, tenê dans, dans, dans.

### ‘Min xwest şahiya Swîngê belav bikim’

Hew dibînim ku ez û dersdarên me Nazlı û Hakan, û Serdil li qata jêr a Lemanê ne. Di dest min de denggirek û em ketine sohbetê ke kûr. Nazlı û Hakan wekî kar tenê danskeriyê dikin. Di vê dewrê de ji kêman kesan in ku debara xwe bi dansê dikin.

Hakan bi dozdeh zimanan dizane û niha xwe hînî kurdî dike. Ji ber ku wê dizanim, gaveke “dîrokî” pê didim avêtin. Pirsên xwe bi kurdî jê dikim û bersivên xwe bi kurdî werdigirim. Piştî ku pirsên min diqedin, bi kêf û ken dibêje, “dibe ku ev ji bo kurdî gaveke biçûk be, lê ji bo min gaveke mezin e.” Jê pirsê hevnasîna wî ya bi Swîngê re dikim, bi kêfxweşî qal dike. Ez jî bi kêfxweşî dibim şahidê hevpeyvîna wî ya kurdî ya ewil.

“Berî diwanzdeh salê min reqsa Swîng dest pê kir. Ez dijîbûm li Îzlandayê lêbelê li Îzlandayê Swîng nebû. Li ser înternetê min workshop dît li Almaniyayê û ew cara yekem bû, 2006 de wilo min dest pê kir. Havîne piranî li Tirkîyeyê bûm û min xwest dersan bidim, şahiya Swîngê belav bikim. Li Stenbolê min dersan da, berî me Swîng nebû, ders nebû. Swing Istanbul serbixwe ye.”

Li gorî Hakan, Swîng bextewarî ye. Piştî ku difikire ev çima li Tirkîyeyê tune ye, cara pêşî ew tê li Tirkîyeyê dersan dide di 2008an de. Lê ne li studyoya xwe ya Swing Istanbulê, li cafeyan. Dû re, di 2010an de studyoya Swing Istanbulê tê vekirin. Niha hewl didin li Wanê, Enqereyê û Edeneyê jî dersên Swîngê bidin.

**‘Dans îfadeya laş a bi muzîkê re ye’**

Nazlı di 2010an de dest bi Swîngê dike. Piştî sal û nîvekê jî dest pê dike dersên dansa Swîngê dide. Dixwazim hîn bibim ka Swîng ji bo wê çi îfade dike, cihekî wê yê çawa heye di jiyana wê de.

“Her roj dansê dikim. Swîng aktîvîteya herî girîng a jiyana min e. Ji bo min taybetiya herî mezin a Swîngê ji dansên din cuda dike hezkirina min a bo muzîka wê ye. Ji ber ku dans îfadeya laş a bi muzîkê re ye. Nêzîkbûna wê ya zêdetir li hunerê jî ji ber awayê îfadekirina hestên wê yên bi muzîkê re ye.”

**‘Swîng çawa hat Amedê?’**

Serdil endezyar e. Li Stenbolê li ser pêşniyara hevaleke xwe diçe li dansa Swîngê temaşe dike. Dibîne ku du sed kes di wê dansê de bi hev re dikenin û ev pir pê ecêb tê. Difikire ku tiştêkî serşahiye, serşabûnê di wê dansê de heye û xwe hînî wê dansê dike. Hewl dide Swîngê bîne Amedê.

Bi meraq ji Serdil dipirsim ka Swîng çawa hat Amedê? Bi destan Nazlı û Hakan nîşan dide û diyar dike ku bi xêra wan hatiye. Pişt re her sê bi hev re biryar didin Swîng

bê Amedê. Nazlı û Hakan mehê carekê du caran tên li Amedê atolyeyan didin dest-pêkirin, dersan didin. Lê gelo tu sedemêkî taybet heye ku piştî Stenbol û Îzmîrê, Swîng were Amedê? Ka em binêrin Serdil çi dibêje.

“Derfetên ku li Amedê hene, zêde ne. Çimkî bi bingeha wê, ciwan hazirî vê ne. Wexta ku ez biçûk bûm, şahiya, mihrîcana li Amedê pêk dihat, neh-deh roj, em dîn dibûn, ez nedîçûm mektebê hefteyekê. Zaroktiya min jî li vir derbas bû. Ez difikirim, bi xêra wê demê bingeha derfetên sosyal li Amedê zêde ne niha.”

**‘Swîng hêvî, ronkahi, hevaltî û kêfxweşî ye’**

Rûşen û Leyla. Her du jî wekî min, lê berî min, hatine ku hînî wê dansê bibin. Rûşen karê projenivîsiyê dike. Leyla mamosteya zimanê kurdî ye. Ji her duyan jî dipirsim ka wan çawa dest bi dansa Swîngê kiriye û ev dans ji bo wan tê çi maneyê.

Rûşen qal dike ku jiyana wê heta çar-deh meh berê ne li gorî dilê wê bûye. Di rewşeke ne xweş û tarî de derbas bûye û bi rastî hêviyên xwe jî wenda kirine. “Di wan

Wêne: Doğan İrmak



deman de min li ser reqsa Swîngê îlanek dît. Ez hinekî fediyok bûm, lê min dîsa ew ceriband. Ji wê dema vir de ez berdewamkerê Swîngê me. Ez dibêim qey dema mirov bi tiştêkî çawa rast hatibe wateya wî tiştî jî wisa dimîne. Ji bo vê sedemê Swîng ji bo min; hêvî, ronkahî û dilşadî ye.”

Leyla cara ewil di medyaya civakî de rastî dansa Swîngê tê. Dibêje, “Bala min kişand û ez tevî bûm” û ev salek e ku berdewam dike. “Reqsa Swîngê nêzikî çanda xwe, nêzikî listikên me yên çandî, dibînim. Dema reqsê dikim ji aliyê derûniyê ve jî xwe aram hîs dikim. Tiştê ku em dikin ne tenê reqs e; hevaltî, kêfxweşî û hwd. e.”

### ‘Dansa herî bikêf a dinyayê’

Her çi qas piranî wekî dansekê tenê tê zanîn jî, dansa Swîngê, di esasê xwe de malbateke dansê ye. Cureyên dansê yên wekî Lindy Hop, Boogie-Woogie, Jive, Rock and Roll, Balboa di nav xwe de dihewîne. Lê di nav wan de îro-roj ya herî naskirî û populer Lindy Hop e. Ez jî ji bo hînbûna vê dansê hatibûm tev li dersên Swîng Amedê bûbûm.

Dîroka Swîngê diçe digihîje salên 1920î yên Serdema Jazzê ya Emerîkayê. Swîng li ber muzîkên jazzê yên wê serdemê şikil digire. Ez nikarim bi tu awayî li Swîngeke bêtî jazzê bifikirim. Lê endamên Swîng Amedê, bi yên Stenbol û Îzmîrê re, li ber def û zirneya li ser Pira Dehderî, bi vê dansê re reqîsîn. Ev dans demekê tê jibîrkirin. Bi salên 1980yî re, bi xêra meraqdarên dansê, jî nû ve li dinyayê belav dibe.

Navê Lindy Hopê, ji Charles Lindberg (Lucky Lindy) tê lê ji aliyê George Snowdenê danskerê ewil ê vê dansê ve tê binavkirin. Ev dans cara pêşîn wekî “dansa herî bikêf a dinyayê” derket pêşiya min. Li bin vîdeoyeke min temaşe kirî bi vî awayî hatibû nivîsandin. Piştî demekê rastî îlana darsa vê dansê ya li Amedê hatibûm. Bi pey ketibûm ku hîni vê dansa herî bikêf a dinyayê bibim.

### Pirsek li xwe

Ber bi 11ê şevê ve xatir ji hevalan dix-

wazim û derdikevim. Hingî min xwêdan daye, ditirsim nexweş bikevim li ber vî bayê zivistanê. Kumê xwe didim serê xwe û li taksîyê siwar dibim. Piştî ku hinekî germ dibim, ji xwe dipirsim: “Lo Înano, te ji her kesî pirsî, lê ez jî ji te dipirsim ka ev dansa Swîngê ji bo te çi ye?” Lê mixabin, şifêr min nabihîze.

“Ezbenî berî her tiştî bi xêra wê, min laşê xwe baştir nas kir, dû re min keşif kir ez dikarim bi kêrî hin tiştên dîtir werim, min qadeke nû ya destpênebûyî ji xwe re peyda kir, dû re keniyam, kêfxweşiya min zêdetir bû, fediya heyî hinekî kêmtir, û ya herî girîng, edebiyat, fikra metna min a herî dirêj a edebî li min peyda bû. Ya bi xêr.”

### LoDublaj, Qutbedîn û Swîng Amed

Piştî qedandina vê nivîsê, min dît ku LoDublaja rûpela navdar û hezkirî ya dublaja kurdî dublajê komîk li ser Swîng Amedê belav kiriye. Di vê vîdeoyê de şeva dansê ya Swîng Amedê derdikeve pêşiya me. Camêrekî qamkinik ê bi navê Qutbedîn bi jineke qamdirêj re dansê dike. Jinek ji nav temaşevanan bi ecêbmayînekê ji hevalê xwe re dibêje “Qama Qutbedîn dirêj nebûye.” Hevalê wê jî dibêje “Sê meh e li kursê ye lê santîmek jî dirêj nebûye.” Herî dawî jî tê gotin ku Swîng Amed, qama kesî dirêj nake lê hîni dansê dike.



Wêne: Nurhayat Çelik



# POPirs



## **Özlem Taş,**

Di sala 1984an de li Wanê hat dinyayê.

Li D.T.C.F'ya Zanîngeha Enqereyê, beşa Şano-Lîstikvanîyê xwend û di 2007an de mezûn bû.

Di sala 2008an de, li Şanoya Dewletê ya Wanê, di gelek lîstikan de lîstikvanî û alîkariya derheneriyê kir. Pişt re çû Stenbolê û li Şanoya Dewletê ya Stenbolê lîstikvanî kir.

Bi hevalên xwe re Theatre Deng û Bêj ava kir. Di sala 2014an de di wê şanoyê de di nav lîstika "Tirs û Xof"ê de cih girt.

Di hin rêzefilm, filmên sînemayê, reklaman de lîst, program pêşkeş kirin û karên dûblajê kirin.

Taş, niha bi Moda Sahnesi û Şermola Performansê re dixebite û di lîstika "Balans"ê derdikeve ser sehnê.

1-Peyva ku tu herî zêde jê hez dikî?

L'appel Du Vide

2-Tu dikarî kêliya xwe ya herî bextewar ji me re bêji?

Derketina ser dikê û di nav rihê karakterekê de wendabûn.

3-Tehemula te ji çi re tune ye?

Tu bi zirîlyon şiklî xwe îfade dikî lê nayî fêmkirin..

4-Te li vê dinyayê herî pir dixwest kê nas bikî?

Pirka diya min.

5- Xeyala te ya herî mezin çi ye?

“Bazdana di nav dorbera bê erdkeşî (yerçekimsiz)” .

6-Bi xêra xwe hevokeke ji strana ku herî zêde jê hez dikî bibêje?

- Is this the real life?

-Is this just fantasy?

7-Çi kenê te tine?

Dema yek bi hêrs diaxive, kes ji tirsê nikare xwe bilebitîne, hahh! li wir kenê min tê nehlet lê be :)

8-Dengê ku tu herî zêde jê hez dikî?

Vê gavê ji dengê xwarziya xwe hez dikim, di vîdeoyekê de strana “My Neighbour Totoro” dibêje. Dengê wê wisa zîq dibe, ecêb li xweşa min diçe.

9- Heke cardin bihatayî dinyayê, te yê çi tiştî cardin bikira?

Bê şik şano û gera welatên din.

10-Tiştê ku îlhamê dide te çi ye?

Temaşekirina behrê

11- Dîmeneke çawa te aciz dike?

Dîmenên şer

12-Te dixwest tu li ku derê bijî?

Xwezî ez li bajarên din ên dinyayê dem bi dem bijiyama. Çend sal li Berlînê, çend sal li Tokyoyê, çend sal li Haitiyê filan bêvan ...

13-Qisûra te ya herî mezin çi ye?

Ez zehf ji fikrên xwe bawer im, dema ez biryarekê bidim tu tişt fikra min naguherîne.

14-Tu dixwazî çawa bimirî?

Dema ku min wexta xwe temam kir, ez ê mafê xwe yê xwekuştinê bi kar bînim. Di nav aramiyê de, di nav nivînên xwe de, ez ê çavên xwe ji bo xewneke şêrîn û bêdawî bigrim. Di fonê de wê Concerto In D Minor'a Bach lêbide :)

15- Dixwazî çi li ser gora te bê nivîsandin?

Êdî bextewar e, hûn jî bextewar bin...





## ME JI 10 KESAN PIRSÎ

Bi ya te di van salên dawiyê de baştirîn lîstika şanoya Kurdî kîjan e? Bo çî?



**Kinem Şahîn**

Di van demên dawiyê de şanoya herî baş a ku min temaşê kir, lîstika bi navê 'Di Tu-waletê De' bû. Rênas Jiyan nivîsandiye û Alan Ciwan lîst. Ew qas têr û tije bû ku mirov ji bîr dikir Alan Ciwan bi tenê dilîze, mirov digot qey çend kes bi hev re li ser dikê ne. Mijar ewqas xweş e ku piştî lîstik diqede jî bandoreke mezin li ser temaşevanan çêdike. Piştî vê lîstikê, ez êdî difikirim ku şanoya Kurdî jî dikare têkeve nav şanoya cîhanê.



**Mihemed Porgebol**

Li gorî min balkêştirîn lîstika di van salên dawiyê de lîstika Teatra Textê Reş a bi navê "Bûka Baranê" bû. Ji xeynê çîrok û vegotina lîstikê, form û teknîka lîstikê ew balkêş dikirin. Di lîstikê de tesîra Grotowski û Artaûd xwe nîşan dida. Li gorî min ji şanoya Kurdistanê re formeke nû divê. Ji ber ku nasnameyeke cidî û nûjen a şanoya me nîn e. Lazim e şanogerên Kurd ji bo şanoya Kurdistanê nasnameyeke nû biafirînin. Li Holanda, Elmanya, Brezîlya û hemû welatên ku di şanoyê de pêş ketin, şanoger; xwediyê cihên girîng in di guherîna her çaxî de. Ev yek ji bo Kurdan jî pêwîst e. Ez jî siberoja şanoya Kurdistanê di Grotowski û Artaûd de dibînim. Lîstika koma Teatra Textê Reş a rojhilatî, di vê astê de ji bo şanoya Kurdistanê muhîm e. Di vê hêlê de dikarim çend lîstikên din ên şanogerên Kurd jî vebêjim, -mîna Disko 5 no'lu'ya Teatra Destarê- lê wekî di serî de min behs kir; Form û teknîka "Bûka Baranê" balkêştirîn bû.



**Ranya Zağlı**

Dema ev pirs ji min hat pirsîn 25 listikvanên jin ên li ser dikê hatin bîra min. Belê ev listik; “Mala Bernarda Albayê” ye ku derhêneriya wê Nazmi Karaman kiriye.

Listik ji hêla Federica Garcia Lorca ve hatiye nivîsandin. Lorca ev listik bi zimanekî gerdûnî nivîsiye. Vê listikê jiyana jinên wî welatî anî bîra min. Lewma em jin her gav dibêjin: “Mesela jinan meseleyeke civakî ye!”

Hêvî dikim ku em ê di siberojê de listikvanên jin û listikên li ser pirsgerêkên jinan pirtir bibînin. Wekî ku Furuk dibêje: “Deng, bi tenê deng mayînde ye.”



**Şerif Kêya**

Ji bo min şanoya kurdî ya herî baş a van salên dawiyê “Tirsa Fuhrer” e. Derhênerê wê Metin Boran, ew ji metna Bertolt Brecht a “Furcht und Elend des Dritten Reiches”ê adapte kiriye. Di nîsana 2016an de, ji aliyê Teatra Jiyana Nû ve, li Sehneya Şişliyê ya Ali Poyrazoğlu hat pêşandan.

Wê çaxê şerê nav-bajaran hebû. Sûr, Nisêbîn û Cizîr wêran bûbûn û Tahir Elçî jî hatibû kuştin. Piraniya kesên ku ev listik temaşe kirin, le’net li faşîzm û zordestiya desthilatdariyê anîn. Lêbelê ji bo min vê şanoyê “fehşîzma” kurdên me nîşan da. Min di dilê xwe de got, “Xwedê meriv şaş kir, kaş neke; kaş kir, fehş neke.”

Li gorî listikê; zilm û zordestiya dewletê tenê ji ber şexsekî ye û ew şexs jî wek serok, fuhrer an jî reîs tên binavkirin. Navê wan çî dibe bila bibe, ew tenê şexsekî nîn in lê min di vê listikê de ev fêhm kir; em temaşevan jî bi tena serê xwe şexs nîn in. Her çi qas navê me temaşevan be jî di listika “Tirsa Fuhrer” de, wekî keriyekî pezan tevdigeriyan, temaşevan digotin qey li hemberî faşîzmê sloganên diavêjin lê ji min re wisa çêdibû ku tenê ji ber “fehşîzm”a xwe dikaliyan, hem jî mîna pezan dikaliyan.



**Devliken Kelogiri**

Bi min, di nav listikên şanoyê yên min temaşe kirine de, ji Bavê Teyar çêtir tune ye.

Çima? Ji ber ku di listik, parodî û sikêçên Bavê Teyar de, xweserbûn heye, ne teqlîd in. Bavê Teyar, xwe ye, xweser e. Teqlîda li ser navê modernîzmê, li ser xwekuştinê, ji nû ve bi ruhekî sexte avabûn e.

**Berivan Gerdenmori**

Wekî hemû çandan, di çanda kurdî de jî çîrok xwediyê cihekî girîng in. Çîrok bi awayekî zarokane, rastiyan baş û xirab ên jiyane hînî zarokan dikin, dersê didin wan. Lê mixabin ev çanda hanê her ku diçe ji nav civaka nûjen dûr dikeve. Nemana vê kevneşopê, di nav civaka kurd de yekcar zêde ye. Êdî zarokên kurd ji tehma çîrokan bêpar dibin.

Şanoya “Şengê û Pengê”, bêrî her tiştî dixwaze bêparbûna zarokên kurd kêm bike, li dika şanoyê wan bi cih bike û dewlemendiyên çîrokbêjiya kurdî derxe pêşberî zarokên kurd.

Şengê û Pengê du xwişk in. Diya wan ji bo ku biçêre wan li malê dihêle û diçe zozanan. Bêriya ku biçêre şîretê li zarokên xwe dike, dibêje “deriyê malê ji kesên xerîb re venekin.”

Bi vî awayî meseleya Şengê û Pengê û gur dest pê dike.

Dramaturg Çetoyê Zêdo û Recep Îçen, çîrok wisa baş li şanoyê adapte kirine ku mirov bi kêfxweşî û bêyî ku aciz bibe temaşe dike. Berhem bi awayekî înteraktîf hatiye danîn. Zarokên temaşevan bi awayekî çalak di listikê de cî digirin. Bi lehangana re xeber didin û hewl didin Şengê û Pengê hişyar bikin. Dramaturgên vê berhemê bi awayekî serkeftî û bi fehmeke pedagojîk berhem lê anîne. Zarok dikarin xwe di nav wan lehangana de bibînin û dersê bigirin. Ez hêvî dikim ku şanogerên Kurd bêhtir ji bo zarokan berheman çêkin, di navbera çîrok, şano û zarokan de pirekê ava bikin

**Aziz Tekin**

Bi min şanoya “Êşa Zimanekî” ya ku ji çîroka “Epîlog” a Hesênê Metê hatiye adaptekirin, serkeftî û hêjayî behskirinê ye. Derhênerê listikê Baran Demir e û Dramaturgiya wê Çetoyê Zêdo kiriye. Şano di salê 2011an de hat listin. Darînê Daryoyê ku li derveyê welêt jiyanê sade dijî, bi hatina birayê xwe Sadûn re dikeve nav geremolekê. Mesele jî ew e; hemû malbat bo serbilindiya xwe li benda Darînê Daryo ne ku şaberhemekê ji wan re bini-visîne. Darînê Daryo xwe davêje bextê Ehmedê Xanî û Celadet Bedirxan lê ji binketinên nenivisandinê xilas nabe. Parodiya nivîskariyê û êşa nivisandinê. Her çendî min çîrok paşê jî xwendibe, zêdetir çûyîn û hatina Darînê Daryo, li ser sehneyê li ber çavên min maye û her ketiyê pêşiya çîrokê. Çimayeke serkeftina wê jî bo min ew e ku şano bingeha xwe ne ji wergerekê, rasterast ji “giyayê hewşê” digre. Ger meriv li piraniya şanoyên di van demên dawiyê de hatine listin binihêre, dê bi rehetî bibîne ku ji zimanên din hatine wergerandin û bêyî lê zêdekirinekê, derxistine ser dikê.

**Semiha Yıldız**

Lîstika Tartuffeyê ya ku bi destê Moliere hatiye nivîsandin, bi kurdî, li Şanoya Bajêr a Amedê bi yek perdeyê hat lîstin. Derhêner Ruknettîn Gun bû. Ji ber derfetan, Şanoya Bajêr a Amedê, lîstik ji 5 perdeyan kiribû yek perde. Lê lîstikvaniya wan ewqas xurt bû ku ev yek qet nehat hîskirin û çîrok gelek herikbar bû. Karakterê Tartuffe Yavuz Akkuzu, karakterê Orgonî jî Ozcan Ateş dilîstin. Her du lîstikvanên jêhatî, bi performansa xwe, lîstik herdem zindî dihiştin û hemî salon di nav kenan de diman. Karaktera xizmetkar jî Elvan Koçerê dilîst. Di vê lîstikê de, tevî lîstikvanên xwedîtecrûbe, hinek lîstikvanên nû ku li Şanoya Bajêr a Amedê perwerde bûbûn jî derketin ser dikê. Wan jî rola xwe têr û tijî pêk anîn. Vê yekê jî, ji bo siberoja şanoya Kurdî hêvî geş kirin.

**Rozerîn Tadik**

Gava min pirsar we xwend dîmeneke wilo hat ber çavên min;

konfeti dipekin, dengê çepikan bilind dibe û lîstikvanên Tartuffeyê (Şanoya Bajêr a Amedê) yeko yeko tîn ser dikê.

Henek li aliyekî, hingî kêfa min jê re hat, min 4 caran Tartuffe temaşe kir. Lîstikeke gelek serkeftî û bêhempa bû. Lîstikvanî, dekor, kostum... Herî zêde mîzah û adaptasyona wan baş bû. Bi îzna Xwedê ez ê 4 carên din jî biçim seyra wê.

**Mem Gewez**

Yek ji baştirîn lîstika van demên dawiyê, bi min Tartuffeya Şanoya Bajêr a Amedê bû; li gorî ziman û lêanîneke xurrî bi kurdî, bi performansên qenc û bi tempoyeke bêhempa, têra dilan temaşevan dan kenandin. Her wiha lîstika Balans'ê ya Şermola Performansê ku bi destê Selim Akgül ve hatiye nivîsîn jî ji hemû aliyan ve ne kêmi şanoyên taybet ên li Stenbolê bû. Helbet hêjayî gotinê ye ku lîstika Şa Performansê, Ji Akademiyê Re Raporek jî serkeftineke gewre ye bo Tuncay Özelê ku ev lîstik bi tena sere xwe amade kiriye.

Weke sazî û navendeke weşangerî  
û rewşenbîriya kurdî li Stenbolê:

# AVESTA



**NÛÇE/ÇAVDÊRÎ**

Mewlûd Oguz

oguzmevlut@gmail.com

Avestayê li Stenbolê bi kokteylekê cihê xwe yê nû vekir



Yek ji weşanxaneya herî mezin û girîng a kurdî, weşanxaneya Avestayê, di dawiya sala 2018an de, piştî şeb-i yeldayê yanî şeva herî dirêj a salê (22.12.2018, Şemî) li navçeya Beyogluyê ya Stenbolê bi kokteylekê cihê xwe yê nû vekir û ji xwendevanan re got merheba.

Tevî nivîskar û xwendekarên Avestayê; şa'ir, hunermend, siyasetmedar, rojnameger, blogger û çendîn kurdên stenbolnişîn beşdarî kokteyla vekirina cihê nû yê Avestayê bûn.

Çalakiya vekirinê ku piştî danê nîvro dest pê kir heta mexrebê berdewam kir, di atmosfereke gelek gelek germ de derbas bû.

Di rê û resma vekirinê de belkî qurban nehat şerjêkirin lê li devê derî hinar hat şikandin û şampanya hat vekirin. Ev yek bi min gelek gelek nazik û kubar hat.

Di merasîmê de qeflek însan hat û yek çû; di nava mêvanan de neviyên Mîr Celadet Alî Bedirxan (1893-1951) jî hebûn. Neviyên Bedirxanî, bi serdana xwe şeref dan weşanxanê û mêvanan.

Ji aliyê din ve, bi saloxan YouTuber Gîska Gerok Gulsumakê ji Moskowayê û Blogger Perxudres taa ji paytexta dilan Amedê û Es-

rakê47 jî taa ji Zeytinburnuya dûr û derez hatin û beşdarî merasîma vekirinê bûn û elbet şeref dan rê û resmê.

Cihê nû yê Avestayê avahiyeke 6 qatî ya bi şaneşîn e û berê weke mal dihate bikaranîn. Ev avahî li gorî eslê xwe hatiye restorekirin û dîzaynkirin. Hundirê avahiyê bi awayekî modern û mînîmal hatiye dirûstkirin. Herwiha li avahiyê, xeml û xişrên çanda kurdî jî darî çav in.

Qata bodrûmê weke depo tê bikaranîn, qeta pêşî cihê pirtûkfiroşiyê ye. Qatek jê odeya xebatê ye, qatek arşiv û pirtûkxaneya Abdullah Keskîn û Avestayê ye û qatek jî metbex û cihê bêhnvedanê ye. Li cihê nû yê weşanxaneyê herwiha terasek jî mewcûd e ku Keskîn di rojên xweş de mêvanên xwe li wir diezimîne.

Di kokteyla vekirinê de xwedî û edîtorê weşanxaneya Avestayê Abdullah Keskin û kedkarên weşanxaneyê Songul Keskin û Kiymet Koçkan, bi awayekî semîmî pêşwazî li mêvanan kirin û yek bi yek bi wan re elaqedar bûn.

Beşdaran û mazûvanan tevî şerab û şirûbên xwe, li ser mijarên cur bi cur sohbet û muhabbet kirin, civateke bi kurdî gerandin.

Li dîwarê derenceya di navbera du qatan da fotografên gelek nivîskar û edîbên kurdî hatine daleqandin ku mirov dikare vêya weke nîşaneyê rêzgirtin, qedirşinasi û hev-girtina peyv û kelama kurdî bi nav bike.







Li ser vê yekê Abdullah Keskin wiha got:

“Zehmet bû lê çêbû, heta ji me hat me hemû anîn ba hev, mala wan a ji peyvan me kir mala xwe, mala we, mala me hemûyan...”

Bi qasî min dît, hem mazûvan û hem jî hemû beşdar ji hedê xwe zêdetir qeşeng û bedew bûn û ewçend nazik û kubar..

Di dawiya çalakiyê de beşdaran ji Avestayê têra xwe pirtûkên kevn û nû yên weşanên Avestayê kirîn.

Piraniya civata kurdî ya li Avestayê piştî bername bi dawî bû, çû konserta Kerem Sevinç a li Cemiyetê û bernameya Chalak Eventsê ya bi navê Dengbêj Nightsê.

Hêjayî bibîrxistinê ye ku weşanxaneya Avestayê ji sala 1995an û vir ve di nava kar û barên weşangeriyê de ye û heta niha piraniya wan bi kurdî/kurmancî, zêdetirî 600 kitêb çap kirine.

Herwiha Avesta heta derfet hebe, dixwaze pirtûk û belgeyên li ser kurd û kurdan dijîtalîze bike û bibe navendeke serlêdanê ya zanîn, rewşenbîrî û lêkolîneriyê.


Navnîşana nû ya Avestayê wiha ye:

Şehit Muhtar Mahallesi, Basma Tulumba Sokak, No: 5 Beyoglu / Stenbol



Heger we  
berî niha  
xwestibe  
hûn li Bakurê  
Kurdistanê  
bigerin

# TRÊNA KU DIÇE WELET



**Ger**  
Şivano Keleş  
sivankelesh@yahoo.co.uk



**Ger**  
Serwero  
serwer\_akarsu@hotmail.com

Heger we berî niha xwestibe hûn li Bakurê Kurdistanê bigerin, xweza û tebîeta Kurdistanê bibînin bêyî ku bikevin nav hingeding û xirecira bajarên, heger we xwestibe hûn rengên bajarên Kurdistanê ji dûranî ve bibînin bêyî ku xwe berdin nava wê kembaxiya ku bi serê wan hatiye kirin, heger we ev tişt xwestibin, ji gerra bi Trêna Eksprêsa Gola Wanê baştir tune ye.



Bi rastî havîna çû me dixwest em bi Trênekê herin Qersê, hevalinan ji me re gotibû ku rêwîtiya bi Trêna Qersê ya 24-seetî xweş e, lê di dema me ya teng de, di havîna gerr û geştê û haziriya Eyda Mezin de xuya ye rê û rêwanî di ya Qersê de nemabû, em mecbûr bûn bilêta Trêna Gola Wanê bibirrin, ev trêna ji ji Enqerê bi rê dikeve, di deşta tirkên re xwe berdide Kurdistanê û di nav çend bajarên me re dibihure heya digihê Tetwanê.

Me bilêtek din jî ji Stembolê birrî û em bi trêna bilez (bi şeref ne bilez bû jî) çûn Enqerê ji bo li wir li trêna xwe siwar bîn. Mala hevlekî me jî li Enqerê bû, me go em ê herin ji xwe re li paytextê bigerin, deverên dirokî bibînin. Em gihan, derket mala camêr li çolekê ye. Me roja xwe û gerra xwe hemû di dolmîşan de bihurand.

Belê roja me hat, berî Eydê bi heftiyekê bû, em berî dema trêna xwe bi sê-çar seetan, li stasyona trêna ya Enqerê wek cinnan hazir bûn, hîn şelêq di çavên me de

bû, çentên me li milên me û tûrikên me yên sandwiçên li malê çêkirî (we di heyata xwe de sandwiçên wilo ziwa nexwarine), qutiyên konservê û çilekiyên me jî di dest me de. Trêna hat, me berî dema birêketinê bi seetekê xwe avêt hundirê trêna ji bo em xwe li ser textên xwe biperrixîn û pix bikin xewê.

Welle em gihan oda xwe ya di Vagona dawî de. Me deriyê odê vekir, errrrek, em çî bibînin! Çarçev û rûber û pêşgîr nû hatine şuştin, şimikên paçik nû hatine çêkirin, pencere û erd û mase tê bê qey bi firça dirana hatine paqijkirin, otêla çar-stêrk na welle pênc-stêrk jî ne wilo bû bi şeref. Me di dilê xwe de got: welle me bi erzani bilêtên xwe birrîn, me henekên xwe bi wan kiriye law!

Vagona me, ya herî xweş bû di trêna de. Tişta pêşî, divabû em li tiwaletê bigerin, di neqeba me û tiwalêta dawiya trêna de jî 2 ode hebûn û di dawiyê de jî pencera terriya trêna ya ku mero vîdyoyên romantîk jê bigire hebû. Min go ez ê herim tiwaletê



biceribînîm û em ê dû re 24 seetan xwe di oda xwe de pehn bikin û wek sînemayê di pencera xwe re li xwezayê temaşe bikin, em ji wilo bêtir çi dixwazin. Ma ne wilo?

Me xwe di oda xwe de perrixand, çend seet bihurîn, carekê me dît mêrikê miawinê trêne hat, dibê qumçoka ku avê berdide tiwalêtê û ya ku avê dikişîne her du jî xera bûne, di bîrowa di ber destşokê de panêlek heye, di wir de 2 qumçokên din hene ji bo berdan û kişandina avê. Mêrik em elimandin bikaranîna wan qumçokan û çû.

Piştî wê bi çend seeta yek ji me çû ti-waletê, çi bibîne! Lehî rabûye. Çi re tu nabê camêr ji kesî din re behsa mesela panêla qumçokan nekiriye, her yek tiwalêta xwe dike, xwe dişo, qumçoka xerabe diceribîne, avê di wir de dihêle û vedigere oda xwe, ji wan we ye wê miawin şûna wan paqij bike. Min dilê xwe xeland, Serwer go ka xwe bide alî, min tiştên ji wilo xerabtir li nexweşxanê dîtine, ez ê paqij bikim. Welle tiwalêt paqij kir û vegeriya odê, ji paqijkirina tiwaleêtê,

bêhna wî bû qulpik. Me îca fêhm kir ku em bûne nobedarên tiwalêtê. Di wê rêwitiyê de gerek meaşek bidana me li ser wê nobedarîyê.

Berî şev bikeve erdê, trêna me ji Enqerê berê xwe da Kirikkale, ji wir jî daket Qeyseriyê. Em bi şev gihan Sêwasê, ji trêne daketin erda stasyonê ji bo em ji xelkê re bêjin “em ji çûne Sêwasê”. A dina rojê em ji xew rabûn me dît ku em di Meletî û Elezîzê re derbas bûne û gihane nêzikî Mûşê. Me Mûşa xwînsar jî dît, hevalên Mûşî xwe aciz nekin, bi şeref dolmîşa Enqerê jî Mûşê xweştir bû, dû re wek ku trêna me wilo li ser hêka dewam kir Tetwanê, me Gola Wanê ji 3-4 qorziya de dît heya ku em gihan Stasyona Tetwanê.

Ji gera li nav xwezaya van deverên ku em tê re derbas bûn, tiştên ku me fêhm kir ev e: heger hûn havînî bi trêne ji welatê tirkan hatin Kurdistanê, heya hûn keriyên pez nebînî zanibin ku hûn hîn negihane axa Kurdistanê. Heger trêna giha Cizîra Botan jî û

we hîn keriyên pez nedîtîbin, zanîbin ku wir nema Kurdistan e. Pez = Kurdistan. Kurdistan = Pez.

Axir em gihan Tetwanê, em ji trêne dake-  
tin, em di cî de li dolmîşa Wanê siwar hatin.

“Xalo em ê di çend saetan de bigihên  
Wanê?”

“Di du saet û nîvan de xwarzê”

Em bi rê ketin, saetek bihurî, dido, sê, hîn  
mêrikê me di nava Wanê de xelkê digihîne  
malên wan, tê bê qey teksî ye. Her ku yekî  
digihîne mala wî jî dadikeve çixarekê vedix-  
we û ji xwe re civatê digerîne bi şifêrên din  
re. Welle di vê rêwitiya dolmîşê de jî me pê  
girt, ji rêwitiya me ya trêne dirêjtir derket.

Hevalê ku li Wanê li hêviya me bû, sed  
xeber ji me re dan, me jî sed xeber ji şifêr re  
dan.

Lê me zêde deng nekir, me go em xwe  
nexin bela şifêrên dolmîşan, em tirsîyan me  
vegerîne Mûşê.

Di gereke wek vê de, ti tişt ji we re ne  
lazim e, tenê serê şexsekî 4-5 sandwîçên li  
malê çêkirî, qutiyek masiyên Tonê, qutiyek  
fasûlî (barbûnya) û hinek çilekiyên şêrîn.  
Heger şûşeyek Skoç an wiskiya Îrlandî bi  
we re hebe jî wê baş be.

Ji xwarinê pê ve 2 dest kaxetên lîstîkê û 2  
kitêb jî bi we re hebin wê baş be. Heger hûn  
di lîstîkên kaxeta de şertên li ser pera nekin,  
pere mere jî ji we re lazim nabin.

Tiştên baş di gerra me ya vê Trêne de,  
erzaniya wê û paqîjiya odayên wê bûn. Yanî  
heger dema we havînî hebe, nêta we hebe  
hûn di derbekê de li gelek bajarên Kurdis-  
tanê bigerin bê ku dakevin nav qerebalixê  
û kelegerma havînê, ev fikra trêne bi rastî  
jî baş e. Û haya we ji tiwalêtan hebe, hûn  
nebin nobedarên wan.

Şivanê Keleş û Serwero.



KOVARA MUZÎKA KURDÎ YA  
ÇARMEHÎ

# Zirryab